

# Plansaziya Zimên di Xebatên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de

Language Planning in the Works of The Kurdish  
Institute of Istanbul

**Şükran COŞKUN**

Şükran COŞKUN | <https://orcid.org/0000-0001-9898-0104>

sukran\_coskun@hotmail.com

PhD. Candidate at Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Türkiye,  
Department of Kurdish Language and Culture, Mardin, Türkiye

## Citation:

Coşkun, Ş. (2024). Plansaziya Zimên di Xebatên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de. *Nubihar Akademî* 21, 11-33. DOI: <https://doi.org/10.55253/2024.nubihar.1478798>.

Submission Date	05.05.2024
Acceptance Date	14.06.2024
Publication Date	30.06.2024
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes – iThenticate
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare.
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the <b>CC BY-NC 4.0</b> .

## Puxte

Ev xebat di çarçoveya plansazîya zimên de hat amadekirin. Xebatên plansazîya zimên yan ji aliyê kesan yan jî ji aliyê sazîyan ve tîn meşandin ku dewletên serbixwe ji bo standardîzasyona zimanê fermî, sazîyan ava dikin. Di vî warî de, plansazîya zimên a madî/gewdeyî û ya statuyê li Tirkîyeyê tenê ji bo tirkî hatîye meşandin. Di rewşa sosyopolîtîk a Tirkîyeyê de kurd, wekî kêmara herf mezin cih digirin û kurdî jî zimanê duyem ê herf berbelav e. Di vî konjonktura sîyasî û civakî de kurdî wek zimanekî standard bi pêş ve neçûye. Ji ber vî yekê, rewşenbîrên kurd, ji bo bilindkirina prestîja zimên û berbelavkirina zimên hewl dane, sazî ava kirine. Ji wan sazîyan yek jî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye. Enstîtu, bi xebatên xwe yê wekî; amadekirina ferhengan, amadekirina pirtûkên rêzimana kurdî, lidarxistina kursên xwendin-nivîsîna bi kurdî, çalakîyên parêzvanîya mafên zimanê kurdî derdikeve pêşberî civaka kurd. Lewma me bi vî xebatê xwest ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji aliyê xebatên we yê plansazîya zimên a madî, statu û plansazîya wergirtinê binirxînin. Çinku ji bo zimanekî standard, pêdivî bi plankirina zimên heye ku xebatên sereke yê plankirinê; plansazîya madî, plansazîya statuyê û plansazîya wergirtinê ne. Ev xebat ji destpêkê û sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de derheqê plansazîya zimên û zimanê kurdî de agahiyên bi giştî hatin dayîn. Di beşa duyem de Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê hat nasandin û di beşa sêyem de ji xebatên enstîtuyê yê derbarê plansazîya zimên hatin nirxandin.

## Peyvên Sereke

Zimanê kurdî, plansazîya zimên, plansazîya statuyê, plansazîya madî (corpus), plansazîya wergirtinê, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

## Abstract

This study was prepared within the framework of Language Planning. Language Planning studies are carried out either by individuals or by institutions, and independent states create institutions for language standardization. In this field, substantive language planning and status planning in Turkey has been carried out only for Turkish language. In Turkey's socio-political situation, Kurds are the largest minority and Kurdish is spoken as the second most common language. In this political and social conjuncture, Kurdish has not developed as a standard language. Therefore, Kurdish intellectuals carried out studies and built institutions to raise the prestige of the language and spread the language. One of these institutions is the Istanbul Kurdish Institute. The Institute showed up the Kurdish society with its work on the preparation of a dictionary, the preparation of Kurdish grammar books, the opening of Kurdish reading and writing courses, and the defense of the rights of the Kurdish language. Therefore, in this study, we wanted to evaluate the Istanbul Kurdish Institute in terms of material language planning, status planning and acquisition planning. Because language planning is needed for a standard language including material planning (corpus), status planning (status) and acquisition planning. This study, consists of an introduction and three parts. In the first part, general information about language planning and the Kurdish language was given. In the second part, the Kurdish Institute of Istanbul was introduced, and in the third part, the institute's studies on language planning were evaluated.

## Keywords

Kurdish language, language planning, status planning, financial planning, acquisition planning, Kurdish Institute of Istanbul.

## Destpêk

Kurdî di nav malbata zimanên Hind-Ewrûpî de di koma Îranî de cih digire û li welatên Îran, Îraq, Sûrîye û Tirkîyeyê pê tê xebardan. Ji ber vê rewşê, plansaziyeke giştî ya di nav civaka kurdan de zehmet e. Lê ji bo jihevfehmkirina civakê pêdivî bi zimanekî hevpar ê standard heye. Di vî warî de li Tirkîyeyê xebatên standardîzasyon û plansaziya zimanê kurdî, di serdema dawî ya Dewleta Osmanî de ji aliyê rewşenbîrên kurd û hinek sazîyan (Komeleya Hêvî<sup>1</sup>, Komeleya Teavûn û Tereqî ya Kurd<sup>2</sup> û hwd.) ve hatine meşandin. Bi hewldana Celadet Alî Bedirxan û kadroya Hawarê, xebatên standardîzasyonê û plansaziya zimên zêde bûne. Di roja me de jî li Tirkîyeyê bi gelemperî bi destên sazîyên kurdî yên wekî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê<sup>3</sup>, Weqfa Mezopotamyayê<sup>4</sup> Weqfa Nûbiharê<sup>5</sup>, Enstîtuya Kurdî ya Amedê<sup>6</sup> û hwd. xebatên wekî kursên zimanê kurdî, aktîvîteyên mafên zimên, weşan û çapemeniyê bi rê ve diçe. Di vî warî de **TZP** Kurdî jî heta 2016an xebatên xwe pêk anîne.

<sup>1</sup> Komeleya Hêvî ji aliyê xwendekarên ku li Stenbolê perwerde dibûn ve di sala 1912an de hatiye damezrandin. Ji aliyê rewşenbîr û karmendên li Stenbolê dijîyan jî alikariyê dîtiye. Berî Şerê Yekem ê Cihanê di navbera 1912-1914an de û piştî şer di 1919-1921an de Komeleya Hêvî xebatên xwe pêk anîne. Komeleyê di serdema yekem de kovarên Rojî Kurd, Hetawî Kurd û Yekbûnê, di serdema duyem de kovara Jînê derxistine. Ji bo agahiyên berfireh bnr. Malmîsanij. (2002). Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti-İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği (1912-1920), İstanbul, Avesta.

<sup>2</sup> Komeleya Teavûn û Tereqî ya Kurd, piştî sazîya yekam a Komeleya Azmî Qawî (1900) di 1908an de wek komeleya duyem ji aliyê rewşenbîrên kurd ve hatiye damezrandin. Bi heman navî rojnameya Kurt Teavûn û Tereqîyê hatiye derxistin. bnr. A. Işık. (2013). Kürt Teavun ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi Kürt Tarihi, s.8, 45-49.

<sup>3</sup> Di 18ê Avrêla 1992yan de Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji aliyê rewşenbîrên kurd ve hatiye damezrandin. Armanca bingehîn a enstîtuyê ev e ku; derbarê zimên, dîrok, edebiyat, etnografya û şaxên hunerê de li ser mîrasa sosyolojîk û çandî ya kurdî lêkolîn bike. bnr. Ş. Kurt (2020). Türkiye’de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018). (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî). Zanîngeha Dicleyê Enstîtuya Zanîstên Civakî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Diyarbakır.

<sup>4</sup> Weqfa Mezopotamyayê di 2013an de li Diyarbekirê hat damezrandin. Armanca weqfê ev e ku piştgiriyê bide perwerdeya ciwanan û xebatên zimên, perwerde, zanistî, çandî, hunerî pêk bîne ku di vî warî de xebatên weqfê yên li ser ziman, perwerde, zanist, folklor û wd. berdewam dikin. (<https://www.mezopotamya.org>).

<sup>5</sup> Weqfa Nûbiharê wek sazîya perwerde û çandî di sala 2011an de hatiye damezrandin. Lê rehên xwe ji kovara Nûbiharê ya di 1992yan de dest bi weşanê kiribû digire, bi rewşenbîr û xwendekarên vê kovarê re peywendîdar e. (<https://www.komanubihar.org>)

<sup>6</sup> Enstîtuya Kurdî ya Amedê, di sibata 2004an de li Diyarbekirê hatiye damezrandin û dest bi xebatên xwe kirîye. Îro jî li ser ziman û edebiyata kurdî xebatên xwe didomîne. Enstîtu girîngiyê daye perwerdeya zimanê zikmakî û di vî warî de gelek kursên zimanê kurdî vekirîye (<https://ku.wikipedia.org>).

Plansazîya zimên ji bo çareserkirina pirsgirêkên zimên hewl dide, di nav alternatîfan de kîjan guncav be tê wergirtin. Ziman, ji aliyê rastnivîs, gramer, peyv an jî wateyê ve bi hûrgilî tê analîzkirin. Bi vî rengî taybetiyên zimên û kulîyateke hevpar derdikeve holê (Cooper, 2000, r. 30). Bi vî awayî ji bo kurdên li Tirkîyeyê; tîkûzkirina gencîneya peyvan, kodkirina nivîseke standard û xebatên ji bo pêkanîna nivîskarî û xwendevanîyê, mirov dikare wekî hewldana standardîzasyonê qebûl bike (Akin, 2013, r.137). Zimanek dikare li gorî gelek biryaran biguhere û pêşve biçe. Lê ev biryar bêtir ji aliyê sazîyên fermî ve tîn wergirtin û birêvebirin. Ev yek wekî plansazîya zimên tê binavkirin. Rewşa Fînlândîyayê ji vî yekê re nimûneya herî berbiçav e. Dema ku di sala 1918an de Fînlândîya serxwebûna xwe wergirt, tu standardeke zimanê fînî tunebû, gelek varyantên cihê yên fînî hebûn û gelek peyvên îdarî, sîyasî û zanistî di nav zimanê fînî de tunebûn. Rêveberîya Fînlândîyayê ji bo çareserkirina van pirsgirêkan sazîyek ava kir. Vê sazîyê bi awayekî rêkûpêk ji bo zimanê xwe standardek çêkir (Filiz, 2017, r.123-124).

Têgiha plansazîya zimên, ji aliyê zimanzanê amerîkî Einar Haugen ve di dawîya salên 1950yî de hatîye pênasekirin. Ji pêşniyaza peyveke nû bigirin heta afirandina zimanekî nû di nav vî tîgihê de cih digire ku politîkayên zimên pala xwe didin helwestên derbarê zimên. Di nav politîkayên zimên de plansazîya madî û ya statuyê cih digire. Ev her du plansazî ji aliyê teorîk ve ji hev cuda bînin hesibandin jî, ji hev gelek dûr nînin. Ew nebe zimanekî fermî jî standardkirin, di statuya zimên de guherînan pêk tîne û hinek awayên plansazîya madî di nav plansazîya statuye de cih digirin (Onen, 2018, r.36-37). Ji bilî vî, plansazîya zimên li gorî tîpolojîya Heinz Kloss ve di sê kategorîyan de tê nîşandan. Ev yek plansazîya madî, plansazîya statuyê û ya wergirtinê ye. Plansazîya madî/gewdeyî ji bo çêkirina termên teknîk, bikeyskirina telafûza peyvan, guherîna alfabeyê yan jî standardîzasyona wê, sadekirina zimên, amadekirina ferhengê, diyarkirina rêgezên ortografî û îmlayê hewl dide ku fonksiyonên wekî guherîn, hêsankirin û nûbûnê di xwe de bihewîne. Di plansazîya statuyê de li gorî zimanên din statuya zimên çî ye, tê diyarkirin ku di vir de ji bo bikaranîna zimên krîterên wekî fermîbûn, zimanê perwerdeyê, sîyaset, jîyana kar û medyayê li ber çavan digirin. Plansazîya wergirtinê ji aliyê Cooper (1989) ve li plansazîyê hatîye zêdekirin. Li gorî vî yekê plansazî, bi taybetî bi rêya perwerde û medyayê digihîje mirovan. Digel vî pêwîst e ku xebatên zêdekirina hejmara axiveran, di nav plansazîya wergirtinê de bê nîrxandin (Kurt, 2021, r.17).

Zimannasê amerîkî Fishman di pirtûka xwe ya “Do not Leave Your Language Alone (Zimanê Xwe Tenê Mehêlin)” de bi taybetî li ser plansazîya zimên disekine. Li gorî Fishman du aliyên plansazîya zimên hene: yek plansazîya statuyê ye ya din jî plansazîya madî (corpus) ye. Li gorî Fishman her çend ev tîgih, tîgihên modern bin jî û plansazîya zimên bi awayekî veşartî be jî

ji serdemên kevnare ve heye. Ji bilî vê Fishman behsa teorîya Reversing Language Shift (em ê çawa bikaribin bişaftina zimên paşde biguherînin) dike. Ev teori li gorî Fishman plansazîyeke alternatîf e û hewl dide ku valahîyên di navbera zanistên civakî û reformên civakî de temam bike. Teorî ji heşt astan pêk tê (Filiz, 2017, r. 129-132). Tê dîtin ku di plansaziya zimên de penaseyeke hevpar tune ye.

Digel vê, endîşeya plansaziya kurdî cara yekem di salên 1930-1940an de bi xebatên Celadet Alî Bedirxan û komeke rewşenbîrên kurd de tê dîtin. Van rewşenbîrên kurd, bi weşana kovarên Hawar, Ronahî, Stêr; xebatên gramerê, berhevokên kurteçîrokên, berhemên werger û hwd. li ser rêya standardbûnê, bingeha sîstema zimên danîye (Öpengin, 2011, r.80). Kadroya Hawarê bi pêşengîya Celadet Alî Bedirxan, hewl daye ku zimanekî yekbûyî çêbike. Ji bo vê yekê berî her tiştî li ser plansaziya madî sekinîye. Hêmaneke sereke ya plansaziya madî, standardkirina zimên e ku mirov dikare vê yekê wekî afirandin û avakirina rêzikên hevpar ên zimên, diyar bike. Plansaziya statuyê jî, li ser peyda kirina erkên nû yên zimên disekine û li ser rola zimên a civakî tesîr dike. Hewce ye bê gotin ku; ev kadro, di plansaziya statuyê de ne çalak be jî di meseleya plansaziya madî de çalak bû (Onen, 2018, r.142-143). Piştî xebatkarên Hawarê, gelek komele û sazîyên kurdan li ser vê mijarê sekinîne û ji bo plansaziya kurdî hewl dane. Em ê di vê nivîsa xwe de, xebatên Estîtuya Kurdî ya Stenbolê ji aliyê plansaziya zimên ve destnîşan bikin. Çinku; Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi xebatên xwe yên li ser zimên û çanda kurdî, lîteratureke nû li Tirkîyeyê ava kirîye. Xebata me ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de di derheqê plansaziya zimên û zimanê kurdî de agahîyên bi giştî hatîye dayîn. Di beşa duyem de Enstîtuya Kurdî hatîye nasandin û di beşa sêyem de jî xebatên enstîtuyê yên plansaziya zimên li ber çavan hatine raxistin ku mijara vê gotarê di çarçoveya plankirina zimên de nixandina xebatên enstîtuyê ne. Armanca sereke ya xebatê ev e ku xebatên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji aliyê plankirina zimên ve bînin senifandin û nixandin.

## 1. Plansaziya Zimên û Zimanê Kurdî

Plansaziya zimên; li gorî polîtîkayên dewletan diguhere, dewletên ku polîtîkayên bişaftinê bi kar tînin û yên pîrzmanîyê diparêzin li gorî helwesta xwe ya zimên plansazîyê pêk tînin. Digel vê, plansaziya zimên ji rêzeke teorî û sepandinê pêk tê ku rehendên siyasî, aborî û civakî di xwe de dihewîne. Herwiha netewedewlet, plansazîyê ji bo standardîzasyon û berbelavkirina zimanê xwe yê fermî çêdikin. Ji aliyê din ve komên etnîk, ji bo hişmendîya neteweyî berê xwe didin plansaziya zimên. Plansaziya zimên carinan bi destê dewletê, carinan jî ji aliyê hin sazî û komên rewşenbîran ve pêk tê. Plansaziya

zimên tenê bi standardîzasyona zimên re ne eleqedar e, ji vê yekê zêdetir hewldaneke guherîna zimên e ku amûrên wekî perwerde û medyayê bi kar tîne. Ji bilî vê plansazî; hertim bi awayekî birêkûpêk dernakeve holê, di heman demê de bi awayekî sergirtî û veşartî jî plansazî pêk tê. Bawerî, helwest, mît, dîn û çanda zimên çawa ku li ser kodkirina zimanekî û neqilkirina navnîşan bi tesir e, li ser zimanê nivîsê û xwendewarîyê jî bi tesir e (Kurt, 2021, r.16-17). Plansazîya zimên tenê ji bo têkilî û danûstendina zimên xurt bike pêk nayê. Di heman demê de sebebên wekî polîtîk, civakî, dînî û hwd. jî plansazîya zimên bi xwe re tîne. Tê dîtin ku plansazîya zimên, ji çareserkirina pirsgirêkên zimên zêdetir wek hewldana tevgera zimên tê pênasikirin. Bi saya tora peywendîyê berbelav dibe ku di nav armanca plansazîyê de di çarçoveyeke hevpar de berbelavbûna zimên cih digire (Cooper, 2000, r.35). Di vî warî de salên dawî yên Osmanî rewşenbîrên kurd, dest bi xebatên xwe kirine ku piştî avabûna Komara Tirkîyeyê jî van xebatan dewam kirîye. Di dawîya sedsala XIX-em de rewşenbîrên kurd ên li Stenbol û navendên din ên Osmanî, bi xebatên çapemenî, weşan û perwerdeyê re mijûl bûne. Ev xebat, bi taybetî dikevin nav plansazîya madî/gewdeyî û plansazîya wergirtinê. Ji ber ku cara yekem xebatên bi vî rengî pêk dihatin, di hişmendîya nasnameya kurdî de jî van xebatan cihekî giring digirt. Ji rojnameya Kurdistanê (1898) bigirin heta kovara Hawarê (1932-1943) weşanên vedor (periodical publication), ji aliyê rewşenbîrên kurd ve hatine amadekirin ku di van xebatan de armanca sereke, di nav civaka kurdan de xurtkirina hişmendîya zimên e (Kurt, 2021, r.15). Ev yek derdixe holê ku hem ziman hem jî fonksiyonên zimên bi demê re diguherin.

Li Ewrûpaya Rojava, dewlet bi armanceke edebî û akademîk ji latînî derbasî zimanên modern ên Ewrûpayê bûn. Bi belavbûna Îslamê re zimanê civakên misilman ber bi erebî ve guherî. Ev guherîn carinan bi awayekî xwezayî, carinan jî bi plansazîyê pêk hatîye. Mesela li Afrîkaya Rohilat zimanê kiswahîlî ji bo karen aborî bi awayekî xwezayî berbelav bûye. Ji aliyê din ve fonksiyonên kiswahîlî yên siyasî, perwerdeyî û dînî bi polîtîkayên zimên pêk hatine. Dîsa Cooper (2000), koçberên ku li Îsraîlê bi cih bûne mînak daye ku ji bo hînbûna îbranî ji gelek kursên curbicur sûdê werdigirin. Dema ku zarokên wan bi qasî polekê bicivin hev, dersên îbranî wek zimanê duyem tînin dayîn, yan jî zarok wek dersên taybet îbranî dibînin. Di heman demê de, weşanên wek rojname, nûçe, rêzefilmên TVyê bi awayekî sivikkirî li gorî asta zarokan tînin çêkirin. Bername bi giştî ji bo plansazîya wergirtinê hatîye amadekirin. Ji bilî vê plankerên zimên ên Sovyetê, ji bo di nav Yekîtîya Sovyetê de rûsî bi hêsanî bê wergirtin, alfabe kirîlî li ser piraniya kêmaran ferz kirîye. Balkêş e ku li Îrlandayê ji bo peywendîya civakî bê xurtkirin, hikûmetê li Dublînê projeyeke du bajarên nû pêşniyaz kirîye (Cooper, 2000, r.99, 157). Wekî ku tê dîtin gelek sebebên plansazîya zimên hene.

Ji bo perwerdeyeke serkeftî pêdivî bi lihevkirina mekan, mamoste, xwendekar û materyalên hînkarîyê heye. Materyalên hînkarîyê ji ber ku çavkanîya zanyarîyê ne, ew li ser perwerdeyê xwedî roleke giring in. Di heman demê de materyalên hînkarîyê di perwerdeya zimên de jî cihêkî giring digirin. Ev materyal, li gorî naveroka dersê û pêdivîyên xwendekaran tîr amadekirin, pratîka zimên di xwe de dihevin. Wer tê dîtin ku pêvajoya hînkirina zimên bêyî materyalên dersê pêvajoyeke kêr e. Di serî de materyalên dersê yê zimên û materyalên hazir, ji bo mamosteyên nû ku dest bi kar kirîye, dibin rêber û karên wan hêsan dikin. Ev materyal, ji aliyê hînkirina zimên ve standardekê çêdikin. Di tecrûbeyên hînkarîya kurdî ya li Tirkîyeyê de jî materyalên hînkarîyê, xwedî roleke mezin in. Em li dîroka materyalên hînkarîya kurdî binêrin; Grammaticaya M. Garzoni (1787) wek pirtûka yekem derdikeve pêşberî me. Piştî vê pirtûka rêzimanê, nêzî du sed sal bi sûn de pirtûkên kurdî li herêmên kurdan hatine weşandin (Kurt, 2020, r.191-193).

Di nav Împaratorîya Osmanî de kurdan, di sedsala XVII-em de xebatên bi zimanê gel pêk anîne. E. Xanî di 1695an de bi kurmançî berhema xwe ya Mem û Zîn nivîsiye. Ji berhemên Xanî Nûbihara Biçûkan û Aqîdeya Îmanê di nav xebatên nesrê de cih digirin. Dîsa berhemên li medreseyan di nav xebatên kurdî de cih digirin. Lê piştî rûxandina Împaratorîya Osmanî, Komara Tirkîyeyê bi qanûna Tevhîd-î Tedrîsatê (1924) medrese girtin. Ji ber vê yekê kurmançî di perwerdeya modern, edebiyat û rêveberîyê de bi giştî pêşve neçû (Leezenberg, 2020, r.56-60). Di vî warî de berhemên nivîskî gelek giring in. Çinku plankirina madî bi gelemperî ji bo zimanê nivîskî tê bikaranîn. Rê û rêgezên rêzimanê tîr diyarkirin, xebatên rastnivîsê tîr çêkirin û ji bo qadên nû yê zimên termên nû tîr diyarkirin (Kaplan & Baldauf, 1997, r.38). Ji ber vê yekê, alfabe ya latînî şoreşeke mezin bû ji bo ekola Hawarê, C. Bedirxan dixwest ji xeynî alfabe, standardîzasyonê çêbibe da ku hemû kurd ji hev fam bikin. Berhevkarî û ferheng jî di standardîzasyona zimanekî de xwedî cihêkî girîng e ku Hawar ji hejmarê ewil ve guh dide vê giringiyê û di dawiyê piraniya hejmaran de ferhengokeke kurdî-kurdî diweşîne da ku xwendevan hem ji naverokê fehm bike, hem jî ev peyv di axaftinê de xerîb nemînin. C. Bedirxan ji bo hînbûna nivîsandin û xwendineke baş rêzimanekê jî belav kirîye di Hawarê de. Ew vê xebatê jî di kurmançiya nivîskî de wek gavekî nû dibîne. Herwiha hîmê zimên jî li ser sê hêmanên bingehîn nîşan dide: alfabe, rêziman û ferheng (Orak Reşitoğlu, 2022: 97,110). Xebat û hewldanên Hawarê di bin qada standîzasyonê de corpûsa zimanê kurdî berfireh kirîye. Plansaziya Hawarê plansaziyeke girêdayî civakê ye, li hin cihan guherbar be jî gelemperî bi awayekî sistematîk hatîye pêkanîn (Şaybak, 2023, r. 52). Ji aliyê din ve em dibînin ku di kovara Rojî Kurd de ku ji aliyê Komeleya Hêvîyê ve hatîye derxistin di bin nasnameya “em”ê de fikrên Kurdîtî, Îslamîtî û Osmanîtîyê dihevin. Rewşenbîrên kurd, nivîsên

xwe yên kovarê wek amûrên îdeolojîk dîtine û ji bo ji milletê xwe re xizmetê bikin nivîsîne. Bi gelemperî li ser mijarên wekî ziman û edebiyata kurd û dîroka kurd sekinîne. Bi amûrên wekî dibistan û weşanê ji milletê xwe re xizmet kirine (Yonat, 2021, r.293).

Li Tirkîyeyê di salên 1960î de li ser alfabeya kurdî û rêzimanê materyal hatine amadekirin ku ev yek heta salên 1990î bûne çavkanîyên bingehîn ên hînkariya kurdî. Pirtûka yekem ji aliyê Kemal Badıllı ve di 1965an de bi navê “Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kurmançca Lehçesi)” hatîye derxistin. Piştî di 1968an de ji aliyê M. Emin Bozarslan ve bi navê “Alfabe” alfabeya kurdî hatîye amadekirin. Ji bilî vê ji aliyê Kamiran Bedirxan û Dr. Şivan ve di 1976an de pirtûka rêzimanê ya bi navê “Zimanê Kurdî” hatîye derxistin. Li gorî lêkolînan, heta sala 2018an bîst heb pirtûkên rêzimana kurdî (kurmançî) hatine weşandin. Ji van pirtûkên hînkariya kurdî; “Kurdîya Nûjen”, “Hînkêr” û “Mamoste” ji aliyê dîzaynê ve serkeftî ne, armanca wan diyar e. Vegotina van pirtûkan nêzî hev in û li gorî standardekê hatine amadekirin, lê di wan de hinek kêmasîyên metodolojîyê derdikevin holê. Dîsa jî mirov dikare bibêje tevî van kêmasîyên xwe, pirtûkên kurdî yên hînkariyê ji bo hînkirina kurdî valahîyeke mezin tije kirîye. Bi vî rengî pirtûkên hînkariyê yên kurdî di plansazîya zimên de ji bo plansazîya madî/gewdeyî û ya wergirtinê roleke giring girtine ser xwe (Kurt, 2020, r.194, 217, 218).

## 2. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

Li Tirkîyeyê polîtîkayên zimên di însakirina nasnameya hevpar de wek amûreke bi tesîr hatîye bikaranîn. Ziman di însakirina dewleta neteweyî de wek teminata yekbûn û nasnameya neteweyî ya tirk hatîye dîtin (Orhan, 2021, r.172). Rewşa piştî darbeya 1980yî, bi pêvajoya endamtiya Yekîtiya Ewropayê ya bi salên 1990î guherî. Bi hinek qanûn û rêzîknameyên derbarê kurdî de, pêşîya kurdî vebû. Di 1992yan de ji bo zimanên ji bilî tirkî, destûra weşanan hat dayîn ku bi vê guherînê rojnameya Welat û kovara Nûbiharê dest bi weşanê kir. Ji bilî vê ji bo xebat û çanda kurdî, enstîtu û navendên çandê hatin damezrandin. Ji van sazîyan, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi taybetî di warê plansazîya madî û ya wergirtinê de xebatên hêja pêk anîne. Navenda Çanda Mezopotamyayê, fikra damezrandina enstîtuyê daye û xwestîye ku xebatên ziman û çanda kurdî bi rêya enstîtuyê ve bê meşandin. Piştî bi tevlêbûna rewşenbîr, sîyasetmedar û nivîskarên kurd, 18ê Avrêla 1992yan de Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê hatîye damezrandin. Armanca bingehîn a enstîtuyê ev e ku; derbarê zimên, dîrok, edebîyat, etnografya û şaxên hunerê de li ser mîrasa sosyolojîk û çandî ya kurdî lêkolîn bike. Di roja ewil a vebûna enstîtuyê de, avahîya enstîtuyê ya li Şişliya Stenbolê, ji aliyê polîsan ve hatîye dorpêçkirin û tabelaya kurdî-tirkî ya



enstîtuyê hatîye daxistin. Dîsa di serdemên cuda de gelek çarçûmên enstîtu, ji alîyê polîsan ve hatîye dorpeçkirin û di Çileyê 2002yan de hatîye girtin. Ancax ji alîyê dadgehê ve di Gulana 2002yan de dîsa hatîye vekirin. Lê bi Biryarnameya di Hukmê Qanûnê (KHK) de careke din hatîye girtin (2016). Enstîtu, bi damezrandina xwe û şûn de rastî astengiyên dadwerî û astengiyên desthilatdarîyê bûye, lê damezrînerên enstîtuyê dev ji xebatên xwe bernedane. (Kurt, 2020, r. 121-122). Di roja me de xebat û çalakîyên enstîtuyê di 2017an û bi şûn de, di bin navê “Komeleya Lêkolînên Kurdî” de dewam dike (<https://www.komeleyakurdi.org>.)

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê (ji niha pê ve EKS), piştî Enstîtuya Kurdî ya Parîsê (1983) û Enstîtuya Kurdî ya Brukselê (1989) li dunyayê wek enstîtuya kurdî ya sêyem (1992) hatîye damezrandin (Sıdal, 2019, r.123). Ji sala 1993yan heta 2000an şeş kongre hatine çêkirin. Di van kongreyan de lijnaya rêveberîyê hatîye nûkirin. Piştî damezrandina enstîtuyê di civîna yekem de ji bo dabeşkirina peywirê ji lijnaya rêveberîyê re Musa Anter, Abdurrahman Durre û İbrahim Gürbüz hatine hilbijartin. Ji bo lijnaya rêveberîyê ya desteya rêveberîyê, Musa Anter wek serok hatîye hilbijartin. Di heman demê de ji bo serokatîya rûmetê İsmail Beşikçi hatîye hilbijartin. Lijnaya rêveberîyê, di civînên xwe yên periyodîk de ji bo vekirina beşa zimên, dîrok û edebîyatê biryar daye. Ji bo serokatîya beşa zimên Feqî Huseyîn Sağnıç, ji bo serokatîya beşa dîrokê Cemşid Bender û ji bo serokatîya beşa edebîyatê Abdurrahman Durre hatine hilbijartin. Ev dabeşkirin ji alîyê plansaziya zimên ve bingeha çalakîyan pêk anîye. Nivîskarên wekî Cemşid Bender, İsmail Beşikçi, Celilê Celîl, Ordîxanê Celîl, Yaşar Kaya yên berê di nav rêxistinên kurdan de cih girtine, hatine hilbijartin. Bi vî rengî di 17ê Avrêla 1993yan de bi Kongreya I. rêzîknameya enstîtuyê hatîye qebûlkirin. Di vê rêzîknameyê de biryarên hatine girtin ji alîyê plansaziya zimên ve berbelavkirina hişmendîya kurdî ji xwe re kirine armanc. Ji alîyê din ve enstîtu di gotara xwe ya 22yê Çileyê 1999an de bal kişandîye ser makeqanûneke hemdem û demokratîk, piştî makeqanûneke nû pêşniyaz kirîye (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.17-18, 45).

Enstîtu ji bo çanda demokratîk û ya zanistîya hevpar li ser mîrasa çanda neteweyî disekine, xizmetê ji bo berhevkirin û nûjenkirina nîrxên hunerî û çandî yên kurdan dide ku xera bûne. Bi vî rengî piştvanîya plansaziya madî ya kurdî dike. Enstîtuyê ev xebatên xwe yên ji 1992yan heta 2002yan bi awayekî kronolojîk di pirtûka xwe ya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de destnîşan kirîye. Ji bo raya giştî ji çalakîyên xwe agahdar bike û xebatên enstîtuyê bigihîne hemû cîhanê, li ser hesabên medyaya civakî (twitter, facebook, instagram, kanala youtube) xebatên xwe par ve dike. EKS, bipêşvebirin û belavkirina zimanê kurdî ji xwe re kirîye armanc. Ji bo kurdî bigihije asteke baş û wekî zimanê

perwerde û rêveberîyê bê bikaranîn, xebatên zimanî û lêkolînî daye ber xwe. Ji bilî vê ji bo berbelavkirina kurdî enstîtuyê, hewl daye ku hişmendîya zimên di nav gel de zêde bike. Ji alîyê din ve hindekarî jî di nav xebatên enstîtuyê de cihêkî giring digire. Ji bo rê li ber windabûn û qelsbûna zimên bê girtin û ziman bi pêş ve bikeve enstîtuyê, xebatên plansazîyeke giştî pêk anîye.

### 3. Xebatên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji alîyê Plansazîya Zimên ve

#### 3.1. Xebatên Plansazîya Statuyê (Status Planning)

Plansazîya statuyê çawa ku li jor jî hate diyarkirin, di bikaranîna civakê de rola zimên derdixe berçav. Ev plansazî ji bo ziman, armanc û qadên diyar e ku bi pirsra “Ziman dê ji bo çi were bikaranîn?” biryar dide ka li cihên kar, dibistanê û li medyayê kîjan ziman dê bê bikaranîn (Şaybak, 2023, r. 24). Di vê çarçoveyê de herçiqaas xebatên plansazîya madî/gewdeyî û wergirtinê li pêş bin jî mirov dikare hin xebatên EKSYê di nav xebatên plansazîya statuyê de binirxîne. Dema ku em bi gelemperî li xebatên EKSYê binêrin EKS ji bo bilindkirina prestîja zimên; di konferans, sempozyûm, seminer, panel û xebatên hwd. Ên navneteweyî de cih girtîye. Ji bo xurtkirina zimên, kampanyayên û komxebatên zimên çêkirine. Digel vê ji bo ziman bi awayekî fonksiyonel bibe zimanê rêveberî, perwerde û hiqûqê bername hatine amadekirin û bi vî rengî hatîye xwestin ku nirxa zimên a sembolîk di nav kurdan de bê parastin. Bi çalakîyên perwerdeya zimanê dayikê enstîtuyê bal kişandîye ser giringîya mijarê. Banga xwedîderketina zimên hatîye kirin ku ji bo polîtîkayên zimên ên desthilatdarîyê bîn sekinandin, bi sîyasetmedaran û bi nûnerên sazî û dezgahan re peywendî hatîye danîn. Bi van hewldanan EKSYê xwestîye ku bîne zimên; kurdî zimanêke têr û tije ye. Bi vî rengî daxwazên kolektîf ên zimên derketine pêş. Di gelek çalakîyan de pankarta enstîtuyê li ser bilindkirina statuya kurdî ye ku pankart bi şiklê “Bila Zimanê Kurdî Bibe Zimanê Resmî û Perwerdeyê” hatîye vekirin ( <https://www.komeleyakurdi.org>).

Enstîtuyê ji alîyekî ve ji bo di pergala sîyasî de meşrû bibe û bê nasîn xebat li dar xistine ji alîyê din ve wê, bi sazîyên civakî yên sivil re têkilî danîye (Sidal, 2019, r.125). Nûnerên enstîtuyê di 28-29ê Berfanbara 1993yan de beşdarî Kongreya Demokrasîyê ya li Stenbolê bûne. Di kongreyê de pirsgirêka kurd û rêyên çareserîyê hatine nîqaşkirin. Enstîtu, beşdarî sempozyûma bi navê “Li Ewrûpayê Neteweperwerî û Nîjadperestî” bûye. Di vê sempozyûma ku di 29-30yê Avrêla 1994an de gelek parlementerên Parlemantoya Ewrûpayê axivîne, nûnerên partîyên sîyasî derbarê çareserîya kêşeya kurdî de ramanên xwe îfade kirine. Ji bilî van mînakên enstîtuyê, di gelek sempozyûmên di vê perspektîfê

de cih girtîye. Di 1994an de li Sofyayê beşdarî konferansekê û di 1995an de li Berlînê tevî “Konferansa Zimanê Kurdî” bûye. Rêveberên enstîtuyê bi mebesta nasandina xebatên enstîtuyê serî li xebatkarên çapemenî, weşan û nivîskarên nasyar daye. Bi saya van serlêdan û hevpeyvînên Hezîrana 1998an ziman û çanda kurdan zêdetir ketîye rojeva raya giştî. Xebateke din a enstîtuyê ev e ku di Lûtkeya Rêxistina Ewletî û Hevkarîyê ya Ewrûpayê (REHE) ku li Stenbolê pêk hatîye, xebatên hêja kirine (Tîrmeh 1999). EKS ji bo lûtke û foruman dosyayêke berfireh amade kirîye. Li ser vexwendina Zanîngeha Bergenê ya Norweçê serokê enstîtuyê teblîxek şandîye Konferansa 2yê Hezîrana 2002yan a navneteweyî ya “Mîrasa Çandî ya Kurd û Norweçê” (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.26, 27,28,40, 44, 47,57).

Hin xebatên enstîtuyê yên ji bo plansaziya statuyê deng daye ku yek jê ji aliyê dadgehê ve nasîna wergêrên kurdî ne. Dadgeha Ewletîyê ya Dewletê (DED-DGM) ya Stenbolê, li ser daxwaza bersûca bi tirkî nizanîbû di 22yê Sermaweza 1999an de biryar girtîye ku ji enstîtuyê wergêrek bê xwestin. Li ser vê yekê bi awayekî fermî dadgehê teblîxat şandîye enstîtuyê. Enstîtuyê, Mulazim Ozcan di sala 2000î de wek wergêr şandîye dadgehê. Ev bûyer di medyayê de wek ku DGM zimanê kurdî û enstîtuyê nas kir cih girtîye. Dîsa tê dîtîn ku li Tirkîyeyê cara pêşîn Roja Ewrûpayê 9ê Gulana 2000î de hatîye pîrozkirin ku ev roj, ji aliyê welatên Yekîtiya Ewrûpayê ve 40 salî zêdetir bû ku dihat pîrozkirin. Di vê rojê de Serokkomarê Tirkîyeyê Suleyman Demirel resepsiyonek daye û yekemîn car bi awayekî fermî sazîyeke kurdan vexwendîye. Serokê enstîtuyê beşdarî vê resepsiyonê bûye û ji aliyê medyayê ve eleqeyêke mezin dîtîye (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r. 45, 49). Ev pengav ji aliyê nasîna enstîtuyêke kurd û zimanê kurdî ve wek pengavên girîng hatine dîtîn.

EKSyê tenê ne li hemberî desthilatdarîya Tirkîyeyê û sazîyên navneteweyî; bi siyasîmedar û sazîyên kurdan ên derveyî Tirkîyeyê re jî peywendî danîne û danûstendinên dîplomatîk û çandî pêk anîne. Rêveberên EKS û NÇMyê daxwaza hevdîtînê ji serokê YNKyê Celal Talabanî kirîye ku Talabanî ji bo hevdîtina ligel rayedarên fermî hatibû Tirkîyeyê. Heyeta hevbeş a enstîtu û NÇMyê li nûnertîya YNKyê ya li Enqereyê di 25ê Adara 1993yan de bi C. Talabanî re hevdîtinek kirîye. Di vê axaftinê de giranî li ser çand, huner, ziman û wêjeyê bûye. Îcar li ser vexwendina C. Talabanî, heyeta hevbeş a enstîtu û NÇMyê di 8ê Hezîrana 1993yan de çûne Kurdîstana Îraqê. Ev gera ku mehekê dewam kirîye di çapemenîya Kurdîstana Îraqê de dengêkî mezin daye (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.17, 22).

Enstîtuyê li hemberî polîtîkayên bişaftinê bernameyên alternatîf derxistine holê û ji bo mîrasa çanda neteweyî ya hevdem pêk bîne hewl dide (Sidal, 2019, r.123). Di 1996an de ji aliyê enstîtuyê ve ji bo Habitatê sê proje hatine amadekirin û bi navê “Bajarê Me yê Kevnarê ku di bin Avê de Dimîne, Koç û Asîmîlasyona Ziman û Çandê” pêşkêşî hatiye kirin. Li hemberî polîtîkayên bişaftinê, EKS ji bo kursên taybet ên kurdî di 15ê Tebaxa 2002yan de daxwaznameyek daye Wezîrtiya Perwerdeyê ya Perwerdeya Neteweyî ku ji bo kursên taybet ên kurdî amade ne. Dîsa careke din 5ê Rezbera 2002yan de daxwaznameyekê daye Wezîrtiya Perwerdeya Neteweyî. Bi vê çalakîyê enstîtu xwestîye ku kurdî bi awayekî fermî bê qebûlîkirin û perwerdeya bi zimanê dayikê belav bibe ku xebatên perwerdeyê ji aliyê enstîtuyê ve hê jî tên meşandin. Dema ku bi mebesta pêvajoya Yekîtiya Ewropayê hin mafên zimên ji aliyê parlamentoyê ve hatibûn dayîn, enstîtuyê jî hewldanên xwe zêde kirine. Di vê çarçoveyê de organên medyayê yê derve û hundir li ser qanûnên guncandî (îbareya zimanê meheli) di navbera Tebax-Cotmeha 2002yan de bi serokê enstîtuyê Hasan Kaya re roportaj pêk anîne (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.33, 57).

Edebîyat jî fonksiyoneke din a plansaziya statuyê ye. Zimanên xwecih ji bo xebatên edebî û zanyarî tên teşwîqkirin. Ev yek taybetîya hevpar a tevgerên neteweyî ye. Netewperwer ji bo ku hişmendîya neteweyî bilind bikin ji edebîyatê sûdê werdigirin. Li gorî Fishman, di bikaranîna zimên de cihê îdeolojî, sembolîzm û retorîkê nayê tijekirin (Cooper, 2000, r.115). EKS di vî warî de giringiyê dide çand û edebîyata kurdî, di nav weşanên xwe de cih dide berhemên edebî û li ser navên edîb û zanayên kurd ên pêşeng, rojên bîranînê çêdike ku hefizeya hevpar a neteweyî zindî bimîne. Rojên bîranînê yê wekî bîranîna Melayê Cizîrî, C.A. Bedirxan û hwd. vesaz dike (<https://www.komeleyakurdi.org>). Digel vê, ji ber ku enstîtu li ser ziman, edebîyat û çanda kurdî lêkolînan dike û lîteratureke giring pêk tîne, di 2001ê de serî li Wezareta Çandê ya dewletê daye ku ji fonên wezîrtiyê îstîfade bike (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r. 53).

### 3.2. Xebatên Plansaziya Madî/Gewdeyî (Corpus Planning)

Ji bo zindîbûna zimên pêdivî bi plansaziya madî/gewdeyî heye ku alfabe ji bo xwendin û nivîsîna zimanekî, xaleke giring teşkîl dike. Plansaziya madî li ser biryara bikaranîna awayê zimên disekine, “Kîjan form dê baştir xizmeta fonksiyonên zimên bike?” dikeve nav vê plansaziyê. Pêşxistina pergalên nivîsandin, gramer, peyvên nû û materyalên hînkirina zimên mînakên plansaziya madî ne (Şaybak, 2023, r.24). Ji aliyê alfabe yê ve niha kurd sê alfabe yên cuda bi kar tînin. Alfabe ya yekem a erebî ji aliyê kurdên Îran û Îraqê

ve hatîye guhertin û bikaranîn. Alfabeya duyem a latînî ye ku ji alîyê kurdên Tirkîye û Sûrîyeyê ve tê bikaranîn. Celadet Alî Bedirxan, di sala 1932yan de bi kovara Hawarê bingeha alfabeya kurdî ya latînî danîye. Alfabeya sêyem a kirîlî ye ku bi rûsî tê nivîsîn û ji alîyê kurdên Sovyetê ve jî dihat bikaranîn. Lê di van demên dawî de li wê herêmê kurdên ku bi kurdîya bakur diaxivin alfabeya latînî bi kar tînin (Khalid, 2020, r.144). Di vê çarçoveyê de bi damezrandina EKSYê, xebatên plansaziya madî hatine kirin. Ji van xebatan a ewil; “Rojên Çareserkirina Pirsgirêkên Alfabeya Kurdî ya Latînî” ye. Vê xebatê deh rojan dewam kirîye. Ji bilî vê di 1997an de tenê ji bo xebatên li ser zimên; komên nû hatine avakirin û wan komên xebatê, şeş mehan li ser grammer, îmla, etîmolojî, edebiyat û çandê ders girtîye. Ev komên zimên, ji bo xebatên xwe binirxînin û plansaziya xebatên paşerojê bikin, di 1998an de çar caran civîn çêkirine. Di van civînan de EKS, li ser rêziman, îmla û alfabeyê sekinîne. Dîsa di 16ê Avrêla 2000î de li Stenbolê Konferansa Zimanê Kurdî hatîye çêkirin (Kurt, 2020, r. 124).

Ji bilî vê divê xebatên grammer û ferhengî jî neyên jibîrkirin. Di plansaziyê de dema ku termên nû tên çêkirin du alternatîf derdikevin holê: 1) a. Termên ji çavkanîyên resen pêk tên, b. Termên ji kokên xwecih pêk tên yan jî c. Ji termeke biyanî tê wergerandin (deyngirtin); 2) gotineke zimanê bîyanî rasterast tê girtin. Di ya duyem de telafûz, rastnivîs yan jî qertaf tên guhertin. Bo mînak; li Endonezyayê plankerên zimên, bi gelemperî ji bo qadên edebiyat, çand û zanistê ji termînolojîya sanskrîtî sûdê werdigrin ku sanskrîtî di nav sedsalên VII-XIV-an de zimanekî populer bû. Lê ji bo qadên zanista modern û teknolojîyê ji termînolojîya Ewrûpayê sûdê werdigrin (Cooper, 2000, r.151). Herwiha Fishman, bi taybetî li ser plansaziya madî disekine û plansaziya madî bi modernîte û îdeolojîyê ve girê dide (Filiz, 2017, r.131). Digel vê, em bala xwe bidin ferhengسازیyê (lexicalization), wekî ku tê zanîn, têkilîya zimên diyardeyê gerdûnî ye û bi awayekî karekterîstîk, di encama peywendîya zimên de deynkirina peyv û îfadeyan di hundirîne. Dema ku zimanekî bibe hilgîrê fonksiyonên fermî (wekî zimanê perwerde û dînî), bi awayekî siruştî ji alîyê rêveberîyê ve xebatên kirin û biryarên dayin, bê ka kîjan peyv orjînal e û kîjan hatîye deynkirin. Di diyarkirina van xalan de berhema karekterîstîk a ferhengسازیyê, ferheng e (Toprak, 2022, r.25-26). Çinku plansaziya zimên, safkirina zimên e yanî paqijkirina zimên ji peyvên bîyanî ye (Filiz, 2017, r. 131). EKSYê jî di nav xebatên xwe de giringî daye avakirina termînolojîyê. EKSYê, ferheng derxistine, li ser rêzimanê xebatên xwe li dar xistine û bi xebatên ferhengê, zimanê kurdî hatîye têkûzkirin. Di nav xebatên ferhengê de, Ferhenga kurdî-tirkî, du ferhengên cuda yên biwêjan, Ferhenga Mîtolojîya Kurdî, Ferhenga Kurdî (Ji bo destpêkê), Ferhenga kurmancî-înglîzî tên dîtin (<https://www.komeleyakurdi.org>). Ferhenga tirkî-kurdî ya 2000î temam bûye

û di hezîrana vê salê de derketîye ku ferhenga herî mezin a tirkî-kurdî ye (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.50).

Di nav armancên enstîtuyê de standardkirina kurdî jî heye. Enstîtuyê ji bo lîteratureke xurt pêk bîne hewl daye. Di xebatên enstîtuyê de tê dîtin ku enstîtuyê li ser xebatên C.A. Bedirxan xebatên xwe ava kirîye û wekî sazîyên din ên kurdan li mîrasya C. A. Bedirxan xwedî derketîye. Enstîtuyê, bi pirtûkên rêzimanê û bi amadekirina materyalên ji bo hînkirina kurdî, tesîr li kodkirina kurdî ya nivîssazî, rêzimanasî û ferhengnasîyê kirîye û giringî daye weşanên Kurdî. Di 17ê Gulana 1993yan de Desteya Rêveberîya Enstîtuyê, bi nûnerên çapemenî û weşanên kurdan re civîneke berfireh pêk anîye. EKS, ji bilî çapemenîya hundir, bi çapemenîya derve re jî di nav peywendîyê de bûye. Bi nûnerên weşanên welatên cihê re gelek caran hevdîtin pêk anîne. Di vî warî de bi weşanên xwe derketîye pêş. Wek ziman kurdîya kurmançî li pêş e, di nav weşanan de xebatên kirmançkî (zazakî) û soranî jî hene. Ji bilî vê hin pirtûk bi tirkî hatine weşandin û yê ji zimanên din ji bo kurdî hatine wergerandin jî di nav xebatan de cih girtine. Di Tebaxa 1993yan de seta “Hîndekarîya Kurdî (ABC, Binêre! Bixwîne! Birengîne! û Xwendin Ronahî ye)” derket ku li gorî asta zarokên dibistana destpêkê hatine amadekirin (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.20, 22).

Li Tirkîyeyê ji ber şert û mercên perwerdeyê, materyalên kurdî xwedî roleke giring in. Çinku piştî mamoste, pirtûkên hînkarîyê ji bo xwendekarên kurdî referansa bingeîn e û divê li gorî çar şîyanwerîyên xwendekaran bîn amadekirin. Li Tirkîyeyê ji xeynî pirtûkên rêzimanê bi armanca hînkirina kurdî ji aliyê Çeto Ozel (2000) ve pirtûka bi navê “Kurdîya Nûjen-Destpêk” (ji weşanên enstîtuyê) hatîye derxistin. Çeto Ozel asta zarokan li ber çavan girtîye, bi metoda modern a eklektîkê xebata xwe amade kirîye. Digel vê di pêvajoya hînkarîya kurdî de wek seta duyem “Hînkêr” (ji weşanên enstîtuyê) derdikeve pêşberî me. Ji aliyê komisyona ku ji Samî Tan, Ronayî Onen, Sadîk Varlı û Mevlut Aykoç ve hatîye amadekirin di gelek kursên sazîyan de wek materyala darsa kurdî hatîye bikaranîn (Kurt, 2020, r.199-200). Ji xeynî materyalên darsê ji bo nasîna zimanê kurdî kitêboka bi navê “Em Zimanê Kurdî Binasin” ji aliyê Hasan Kaya, Zana Farqînî û Samî Tan ve hatibû amadekirin di Tîrmeha 2001ê de hatîye weşandin (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.54). Dîsa ji bo fêrkirina kurdî, Kovara “Fêrname”yê hatîye weşandin. Kesên ku nû hînî kurdî dibin dikarin bi alîkarîya vê kovarê xwendina xwe bi pêş ve bixin û çand û edebiyata kurdî nas bikin. Çar hejmarên kovarê derketine (heta 2019an), piştî weşana kovarê sekinîye (<https://www.komeleyakurdi.org>).

Di 20ê Berfanbara 1993yan de li Tirkîyeyê cara yekem Salnameya Kurdî derketîye, navên mehên kurdî tê de hatine dayin. Hejmara pêşîn a organa Enstîtuyê, Zend di 21ê Adara 1994an de derketîye. Kovara Zendê digel mijarên din, bi nivîs û lêkolînên zimên, hişmendîya zimên xurt kirîye. Enstîtuyê di warê çanda devkî de biryara berhevkirina biwêj û gotinên pêşîyan daye û ji bo vê yekê di Berfanbara 1997an de komîsyonek ava kirîye. Wê berhemên çandî û folklorîk amade kirîye, klasîkên kurdan raxistine berçavan. EKS bi vê xebatê xwestîye ku haya kurdan ji çand, dîrok û paşxaneyê wan a dewlemend hebe û hişmendîya wan a zimên zêde bibe. Em di vî warî de li çend berheman binerin; pirtûka ji aliyê Remezanê Botî ve hatîye amadekirin bi navê “Zargotin” (1996) hatîye weşandin. Du pirtûkên zargotinî yên H. Akyol ên bi navên “Tembûrzêrîn û Tembûrzîvîn” û “Çapik Ehmed û Mîrze Mihemed” (2002) hatîye weşandin (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.26, 27, 36). Bi heman awayî berhema “Gotinên Pêşîyan” (2009) a Mehmet Oncu hatîye derxistin (<https://www.komeleyakurdi.org>). Ji berhemên klasîk; Yûsif û Zuleyxa ya ji aliyê Selîmî ve hatîye nivîsîn (1998), du dîwanên Feqîyê Teyran ên “Ey Av” û “Şêxê Sen’anî” (1998) dîwana Sîyahpûş ku ji aliyê M.R. Irgat ve tîpçuhezîya wê hatîye kirin (1999), dîwana Şêx Evdîrehmanê Axtepî û dîwana Şêx Mihemedê Kerbelayî (2002) hatîye weşandin. Pirtûkên bi navê “Kürtlerin Kökeni: Ari Boylardan Urartular” û “Kürt Sultan Salahaddin Eyubi Hanedanlığı” ku ji aliyê Torî ve hatibûn nivîsandin di Kewçera 2001ê de hatîye weşandin. Dîsa “Nehcul Enam” a Mele Xelîlê Sêrtî û “Sîrul Mehşer” a Feqe Reşîdê Koçerî (2002) di nav weşanên EKSyê de cih girtine. Pirtûka H. Mem a “Üçüncü Öğretmen Xani”, “Dîroka Wêjeya Kurdî” ya Feqî Huseyn Sagnîç û “Kovara Rojî Kurd” (Transkrîbe û Werger) jî ji aliyê enstîtuyê ve hatîye weşandin (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r. 37,41,42,48,54,55,57,58; <https://www.komeleyakurdi.org>).

Ji xeynî van berheman bi gelek berhemên din ên kurdî, heta roja me EKS weşanên xwe domandîye. Di hesabê medyaya civakî ya enstîtuyê de tê dîtin ku tevî hin pirtûkên çapên wan ên nû derketine, ji pêncî zêdetir berheman hatine weşandin ku ev berheman li ser mijarên curbicur in. Dîsa tê dîtin ku gelek caran berhemên wan ên çapbûyî hatine astengkirin. Mesela albûma kronolojîyê ya bi navê “1900’den 2000’e Kürtler (Ji 1900î heta 2000î Kurd)” ku bi hevkarîya rojnameya Ozgur Bakışê hatibû amadekirin di Sibata 2000î de hatîye weşandin lê ji aliyê Dadgeha Ewletîya Dewletê ya Stenbolê ve hatîye berhevkirin (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.47). Van xebatan, di qada lîteraturê de valahîyeke mezin tije kirîye.

Di tabloya jêrê de weşanên enstîtuyê yên ku li jor behsa wan hat kirin bi awayekî kronolojîk cih digire:

<b>Dîrok</b>	<b>Navê Berhemê</b>	<b>Cure</b>	<b>Nivîskar/Komxebat</b>
1993	Seta Hîndekarîya Kurdî	Hîndekarî	EKS
1993	Salnameya Kurdî	Salname	Amd. Feqî Huseyîn Sagnîç
1994	Kovara Zendê (heta niha 29 hejmar)	Kovara lêkolîn û zanistê	EKS
1996	Zargotin	Zargotin	Remezanê Botî
1998	Yûsif û Zuleyxa	Klasîk	Selîmî
1998	Ey Av û Av/ Şêxê Sen'anî	Klasîk	Feqîyê Teyran
1999	Dîwan	Klasîk	Sîyahpûş
2000	1900'den 2000'e Kürtler (Ji 1900î heta 2000î Kurd)	Albûma Kronolojîk	EKS, ed.Z.A.Kizilyaprak
2000	Kurdîya Nûjen	Hîndekarî	Çeto Ozel
2000	Ferhenga Kurdî-Tirkî	Ferhengnasî	Zana Farqînî
2001	-Kürtlerin Kökeni: Ari Boylardan Urartular -Kürt Sultan Salahaddin Eyubi Hanedanlığı	Dîrok	Torî
2002	-Dîwana Rûhî -Dîwana Kerbelayî -Üçüncü Öğretmen Xani	Klasîk Klasîk Biyografi	Şêx Evdîrehmanê Axtepî Şêx Mihemedê Kerbelayî H.Mem
2002	-Tembûrzêrîn û Tembûrzivîn -Çapik Ehmed û Mîrze Mihemed	Zargotin	H.Akyol
2002	-Nehcul Enam -Sirul Mehşer	Klasîk	Mele Xelîlê Sêrtî Feqe Reşîdê Koçer
2002	Dîroka Wêjeya Kurdî	Edebîyat	Feqî Huseyn Sagnîç
2005	Ferhenga Biwêjan	Ferhengnasî	Dilawer Zeraq
2008	Hînker	Hîndekarî	S.Tan-R.Onen-S.Varlı-M.Aykoç
2009	Gotinên Pêşîyan	Zargotin	Mehmet Oncu
2013	Kovara Rojî Kurd	Kovara Lêkolîn û Zanistê	Komeleya Hêvî, Amd.Koma Xebatên Kurdolojîyê
2014	Kovara Fêrname	Hîndekarî	EKS
2014	Ferhenga Biwêjan	Ferhengnasî	Mustafa Borak
2017	Ferhenga Mîtolojîya Kurdî	Ferhengnasî	Kamûran Yîtik-Ramazan Çeper
2019	Ferhenga Kurdî/Ji bo Destpêkê	Ferhengnasî	Abdurrahman Bakır
2022	Ferhenga Kurdî-Îngîlîzî	Ferhengnasî	Samî Tan-Aysel Çetîn



Enstîtuyê bi armanca ku zimanê kurdî bigihije standardekê û pirsgirêkên li ser zimên bê çareserkerin li Stenbolê bi navê Gelşên Alfabeya Latînî ya Kurdî û Metodên Çareseriyê civîneke ji du hefteyan pêk tê (1993) li dar xistîye. Dîsa li ser hîmdarê alfabeya kurdî ya latînî C. A. Bedirxan (1993), konferansa bi navê Rewşenbîrên Kurd C. A. Bedirxanî çêkirîye. Li Enqereyê bi alîkarîya enstîtuyê, Egitim-Senê Sempozyûma Perwerdehîya bi Zimanê Dayikê (1996) çêkirîye. EKSyê di 1998an de giranî daye ser xebatên zimên û civînên li ser rastnivîs, rêziman û alfabeyê yên kurdî hatine çêkirin. Wek mînak; ji bo ku di çapemenîya kurdî de, di warê rastnivîsê de hevgirtinek pêk bê hema bêje bi hemû sazîyên kurdan re di navbera 28ê Sibatê-23yê Gulanê ya 1998an de çar civîn hatine amadekirin. Rêveberên enstîtuyê li Stenbolê li Zanîngeha Azad, bi komêk rewşenbîrên kurd re (1998) civînek çêkirîye. Ji bilî vê enstîtu, tevî panela li Tirkîyeyê Mafên Çandî û Perwerdehîya bi Zimanê Dayikê (2001) bûye (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r. 22, 25, 33, 38, 41,55). Bi gelemperî mirov dikare bibêje ku ji bo balê bikişîne ser zimên, enstîtuyê gelek xebat li dar xistine ku panelên li ser aktîvîzma zimên, gotûbêjên li ser çand û edebiyata kurdî, hevpeyvînên li ser zaravayên kurdî û hwd. çêkirîye (<https://www.komeleyakurdi.org>). Xebatên bi vî rengî perspektîfa enstîtuyê ya di warê zimên de diyar dike û ji bo kurdî gavên giring ên plansaziya zimên pêk tîne.

### 3.3. Xebatên Plansaziya Wergirtinê (Acquisition Planning)

Plansaziya wergirtinê biryar dide ka dê kî, çawa plansaziya zimên pêk bîne. Pirsra ku dike ev e, "Divê axiverên zimên xwedî kîjan qabiliyetan bin ji bo ku fonksiyonên zimên rast bi kar bînin?". Amadehîya mamosteyên zimên û plankirina perwerdeyê mînakên vê plansaziye ne (Şaybak, 2023, r.24). Ji van hêmanan perwerde di xebatên enstîtuyê de derketîye pêş û enstîtuyê ji bo perwerdeya kurdî gelek hewl daye ku perwerde xaleke giring a plansaziya wergirtinê ye. Wekî ku tê dîtin li Çînê mandarînî wek zimanê fermî hatîye qebûlkerin ku piştî vê yekê bi rêzê mamoste û xwendekar bi vî zimanî hatine perwerdekirin. Ji bo belavbûna mandarînî ji radyo, rojname û hwd. sûd hatîye wergirtin û medya di navbera salên 1946-1956an de di bernameya zimên a neteweyî de hatîye bikaranîn. Xebateke din a bikêrhatî li Zelandaya Nû hatîye meşandin. Ji bo zindîmayîna zimanê maorî malên zimên hatine vekirin. Di van malan de rûsipiyên civakê (kal û pîrên extîyar) û zarokên pêşdibistanê anîne cem hev. Bi xêra vê xebatê gelek zarokan, dema ku dest bi dibistanê kirîye maorî di jîyana xwe ya rojane de bi kar anîye. 2000-3000 zarokan bi awayê duzimanî dest bi dibistana serete kirîye. Ev mînakên plansaziya wergirtinê herî kêr bi du esasan ji hev tîne veqetandin. Yek jê plansaziya zimên a vekirî ye, ya

din rêbaza armancê ye. Lê ji bo berdewamîya zimên esasa sereke bikaranîna zimên e, hewce ye ku zimên ji alîyê nîfşên nû ve bê bikarananîn. Ji ber vê yekê jî di nav plansazîya zimên de ev yek cih digire (Cooper, 2000 r.158-159). EKSYê jî ji bo nîfşên nû yên kurd, bi zimanê dayikê hîn bibin û zimanê kurdî bê bikaranîn, komxebat li dar xistine. EKSYê di xebatên plansazîya wergirtinê de çalakîyên birêkûpêk meşandine ku wek mekanê perwerdeya kurdî xebatên xwe amade kirine. Li Tirkîyeyê berî vesazkirineke zagonî, wê dest bi perwerdeya kurdî kirîye, kursên zimanê kurdî vekirine. Kursên enstîtuyê jî çar astan pêk tên ku ji asta destpêkê heta asta mamostetîyê diçin. Kesên sê kursên pêşîyê tamam dikin û ji ezmûnê derbas dibin di kûra dawîyê de, beşdarî kûra mamostetîyê dibin. Yê ji vê kûrê derçûne, li Stenbol û bajarên din ên li Tirkîyeyê di bin banê sazîyan de di kursên kurdî de mamostetî kirîye. Bi vê hewldanê jî bilî plansazîya madî/gewdeyî di warê plansazîya wergirtinê de xebat pêk anîne. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê heta damezrandina **TZPK** Kurdî, sêzdeh salan li Tirkîyeyê bûye navenda xebatên plansazîya wergirtinê (Kurt, 2020, r. 124-125).

Di wan kursan de dersên rêziman, rastnivîs, etîmolojî, edebîyat û çandê dihatin dayîn ku ji bo xebatên zimên di 1997an de şeş meh perwerde hatîye dayîn. Enstîtuyê sala 2000î xebatên li ser zimên dane destpêkirin. Bi vê mebestê, 31ê Çileyê 2000î xebat dest pê kirîye û 15 rojan dewam kirîye. Di vê xebatê de 40 hînkarî cih girtine. Di asta pisporîyê de xebata zimên a çar mehan dest pê kirîye û di Gulana 2001ê de yê serkeftî bûne, sertîfîkayên xwe girtine (Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.35, 46, 54). Bikaranîna zimên a bi awayekî serkeftî girêdayî bidestxistina amûrên wekî dengsazî, peyvsazî, watenasî û gencîneya peyvan e. Di vê pêvajoyê de mirov ji rêzîkên rêzimanî û avahîya zimên haydar dibin. Têgihîştina wan ji dengsazî, peyvsazî û hevoksazîya zimanê wan çêdibe. Enstîtu bi varyantên zimên re jî mijûl bûye. Xebatên xwe pîrzaravayî meşandîye, di van zaravayan de jî atolyeyên zimên vekirine ku hê jî kursên kurmançî, kirmanckî(zazakî), soranî berdewam in. Bi heman awayî di nav kursên enstîtuyê de yê kelhurî û hewramî jî cih digirin. Digel vê li hember devokên cuda yê zimên jî hewl dane ku devokên cuda li derve nehêlin, wek dewlemendîya zimên devokan biparêzin û nişan bidin. Xwendekarên ji herêmên cuda tevî pêvajoya hînbûnê kirine û rê li ber peyv û qalibên devokên cuda vekirine ku bi vî awayî derdoreke înteraktîf ava kirîye. Dîsa ji bo mamoste û xwendekar lêkolînên xwe parve bikin kovara "Fêrname"yê derxistîye. Ji bo kesên dixwazin bi kurdî bixwînin, binivîsin û kurdîya xwe bi pêş ve bibin dersên online hatine amadekirin. EKSYê jî bo parêzvanîya zimên û çanda xwe dest bi dersên online kirine ku bi vî rengî tenê bi Stenbolê bisînor namîne, beşdarî zêde dibe. Bo mînak; di 6ê Avrêla 2020an de di nav nîvrojê de ji 1000 kesî zêdetir serlêdana dersa online kirine. Serlêdan gelek zêde ne, di nav çend saetan de kesên dixwazin dersê bigirin ji 500-600 kesî derbas dibe. Dîsa li ser

kanala xwe ya youtubê bi navê “Kurt û Kurmancî” vîdeoyên dersên rêzimanê hatine belavkirin ku enstîtu bi vê rêyê gihastîye girseyeke mezin ên kurdan. Di vê çarçoveyê de ne tenê ji bo kesên gihastî ji bo zarokan jî atolyeyên zimanê kurdî tîn vekirin û heftê rojek du ders tîn dayîn. Li gorî asta zarokan, zarokên 4-6 salî yên bi kurdî dizanin û zarokên 7-10 salî yên kurdî nizanin ji hev hatine veqetandin. Di van atolyeyan de stran, lîstik, navên ajalan, şekil, hejmar û hwd. bi kurdî hîn zarokan dikin (<https://www.komeleyakurdi.org>).

Ji alîyê din ve xaleke giring a perwerdeya kurdî amadekirina materyalan bû. Ji ber pêwîstîya materyalan, enstîtuyê dest bi amadekirina materyalên dersê kirîye ku wekî me li jorê destnîşan kir; xebatên wekî Kurdîya Nûjen-Destpêk (Ç. Ozel) Hînger (S. Tan-R. Onen-S. Varlı-M. Aykoç), Rêzimana Kurmancî (S. Tan) û xebatên wekî Hindekarîya Xendin û Nivîsînê (M. Aykoç), Xebata Gramerê (S. Gultekîn), Lêker û Rastnivîsa Wan (Z. Farqînî), Hînger Soranî, ji bo zarokan Hînger Zarok û hwd. hatine amadekirin (<https://www.komeleyakurdi.org>).

Dîrok	Navê Berhemê	Cure	Nivîskar/Komxebat
2000	Kurdîya Nûjen	Hîndekarî	Çeto Ozel
2008	Hînger	Hîndekarî	S. Tan-R. Onen-S. Varlı-M. Aykoç
2010	Ro Ser Zarawaya Kirmanckî	Rêziman	Sabahattin Gultekin
2011	Rêzimana Kurmancî	Rêziman	Sami Tan
2012	Hîndekarîya Xwendin û Nivîsînê	Hîndekarî	Mevlut Aykoç
2014	Kovara Fêrname	Hîndekarî	EKS
2019	Lêker û Rastnivîsa Wan (Ji Alîyê Binyatî Ve)	Rêziman	Zana Farqînî
2020	Hînger (Soranî)	Hîndekarî	Hewa Selam Khalid
2023	Hînger Zarok	Hîndekarî	J. Ay-R. Baysal-R. Onen-S. E. Subaşî

## Encam

Wekî ku ji xebatên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê tê dîtin; enstîtu ji bo pêşveçûna zimanê kurdî hewl dide. Bi xebatên xwe yên pirrehendî yên wekî panel, hevdîtin, guftûgo, çapemenî, kursên zimên û hwd. enstîtu tevkarîya

plansazîya kurdî dike. Di çarçoveya plansazîya madî/gewdeyî de ji bo kurdî bibe zimanekî standard, ji xebatên rêzîmanê bigirin heta yên ferhengê xebatên bingehîn pêk anîne, weşanên kurdî çap kirine, EKS bal kişandîye ser mijarên bi zimên re eleqedar. Dîsa di çarçoveya plansazîya statuyê de ji bo kurdî bibe zimanekî biprestîj û zimanê perwerdeyê û bibe zimanê fermî zebat hatine meşandin. Di vî warî de li ser rûmeta sembolik a kurdî hatîye sekinandin. Bi heman awayî di warê plansazîya wergirtinê de jî enstîtuyê; xebatên perwerdeya bi kurdî meşandine û ji bo hînbûn û hînkirina kurdî xurttir bibe mamoste gihandine, materyalên dersê amade kirine. Em dikarin bibêjin ku vê xebatê, xwe gihandîye girseyeke mezin a kurdan û di warê hişmendîya kurdî de li ser civakê tesîreke mezin kiriye. Bi saya van xebatan di warê plansazîya madî/gewdeyî (corpus planning) û plansazîya wergirtinê (acquisition planning) de xwendewarîya kurdî di nav kurdan de ji zarokan heta kesên gihaştî belav bûye. Enstîtu bi tecrube û zanyarîya xwe ji bo xebatên zimên bûye pêşeng, lîteratûreke nû ava kirîye.

### Çavkanî

Akin, S. (2013). *Lêkolînên Zimannasiya Kurd*. Stenbol: Avesta.

Cooper, R. L. (2000). *Language planning and social change*. Cambridge University Press.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê. (2002). ed.Z. Abidin Kızılyaprak, Stenbol.

Filiz, M.Ş. (2017). Sosyolînguîstîk û Jousha A. Fishman. *Gotarên Zimannasîyê*. (ed. Kenan Subaşı & Resul Geyik). Stenbol: Nûbihar, 119-133.

Işık, A. (2013). Kürt Teavun ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi. *Kürt Tarihi*, s.8, 45-49.

Kaplan, R. & Baldauf, R. (1997). *Language Planning: From practice to theory*. Clevedon: Multilingual Matters.

Khalid, H. S. (2020). Kurdish Language, Its Family and Dialects. *Kurdiname*, j.2, 133-146.

Kurt, Ş. (2020). *Türkiye’de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018)*. (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî). Zanîngeha Dicleyê Enstîtûya Zanistên Civakî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Diyarbakır.

Kurt, Ş. (2021). Kürtçe İçin İlk Dil Planlaması Örnekleri: Rojî Kurd ve Hetawî Kurd Dergilerinde Dil ve Eğitim Tartışmaları. *Kebikeç İnsan Bilimleri İçin Araştırma Dergisi*, c.52, s.52, 14-31.

Leezenberg, M. (2020). *Vernacularization as Governmentalization: the Development of Kurdish in Mandate Iraq. Arabic and its Alternatives*, Amsterdam School for Cultural Analysis (ASCA), Leiden: Brill Publish, 50-76.

Malmîsanij. (2002). *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti-İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği(1912-1920)*. İstanbul: Avesta.

Sidal, S. (2019). *Yeni Tolumsal Hareketler Bağlamında Türkiye’de Anadilde Eğitim Talepleri: TZP Kurdi Örneği (2006-2011)*. (Yayınlanmamış Doktora Tezi). Galatasaray Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü Siyaset Bilimi Anabilim Dalı.

Şaybak, Z. (2023). *Metoda Vejandina Zimên: Mînaka Kovara Hawarê*. (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî). Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Onen, R. (2018). *Ziman û Netewesazî-Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*. (wer.Şehmuz Kurt). Stenbol: Peywend.

Orak Reşitoğlu, S. (2022). *Mînaka Standardkirina Kurdiya Kurmancî: Kovarên Hawar û Ronahîyê*. (Teza Doktorayê ya Neçapkirî). Diyarbakır Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.76-112.

Orhan, S. (2021). Bir Ulus-Devlet Örneği Olarak Türkiye’de Dil Politikaları ve Dil Hakları. *Türkiye’de Dil Hakları ve Dilsel Çoğulluk*. (ed. Bülent Bilmez). Türkiye Kültürleri Araştırma Grubu, İstanbul, 171-194.

Öpengin, E. (2011). *Rewşa kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkîyeyê*. Stenbol: Avesta.

Toprak, B. (2022). *Serborîya Hewldanên Standardkirina Kurdîya Kurmancî li Tirkîyeyê (Ji Kovara Hawarê Heta 2000yan)*. (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî). Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Yonat, M. (2021). Rojî Kurd’de Müslüman, Osmanlı ve Kürt Kimliklerinin Söylem Analîzî. *Kebikeç İnsan Bilimleri İçin Araştırma Dergisi*, c.52, s.52, 279-296.

<https://www.komanubihar.org>.

<https://www.komeleyakurdî.org>.

<https://ku.wikipedia.org>.

<https://www.mezopotamya.org>.

### **Extended Abstract**

The languages change and proceed by many different regulations. Standardization studies are necessary for the social communication and people to understand each other. Standardization is carried out within the language planning. Language planning includes corpus, status and acquisition planning. In this context, generally, associations take role and conduct activities of planning. Kurdish Institute of Istanbul is one of the associations that conducts planning on Kurdish language. The idea of founding this institute came up by Mesopotamia Cultural Centre. In addition to it's language studies, the Institute also has studies on history, literature, ethnography and art. These studies determine the institute's perspective on the language and constitute the language planning steps for Kurdish in Turkey, and the institute carries out a general language planning study within it's means against the risk of the weakening and disappearance of Kurdish.

Kurdish Institute of Istanbul was opened in 18 April 1992 with the help of many Kurdish writers and politicians. The board of directors of the institute decided to found language, history and literature departments within the association. These department constitute the basic studies in terms of language planning. The decisions taken at the 1st Congress in 1993 aimed to create language awareness in terms of language planning. In this context, while trying to preserve folk literature with its collection works, The institute also focused on the language structures that were damaged. The Institute made significant contributions to Kurdish language planning in Turkey for thirteen years until the establishment of TZPKurdi.

The Institute has faced with many difficulties since they were founded and sometimes even stopped their studies but then they moved on. Therefore we analyzed and unfolded the studies of this institute on the language. In addition to literature search for the study, we also got information about studies of the Institute on the website of Kurd Research Association. This study has an introduction and three parts. In the first part, we focused on language planning and Kurdish language. In the second part, we introduced Kurdish Institute of

Istanbul. In the third part, we evaluated and classified the institute in terms of status, corpus and acquisition planning.

We evaluated the institute's language planning works and classified them with status planning, it worked to protect the language and increase its prestige. It made efforts to ensure that Kurdish could be used officially and become the language of education. Although these studies were not enough to bring about a serious change in Turkey, language awareness was created by attracting the attention of the public. The Institute communicated with many associations and non-governmental organizations and called for the protection of the Kurdish language. In addition to that it contributed to status planning with panels, conferences, interviews and publications and carried out basic studies for language standardization, grammar and dictionary studies, and corpus planning. Development of the writing system, grammar, creation of new words and creation of learning materials are among the studies carried out in the field of corpus planning. The Institute has books prepared in many fields, from classical Kurdish literature to folklore and modern literature .

At the same time, the institute conducted Kurdish teaching activities for acquisition planning. In the language courses, grammar, spelling/orthography, etymology, literature and culture. The Kurmanji dialect of Kurdish was mainly used in the institute's works and workshops have also been opened in Zazaki and Sorani dialects and Kelhuri and Hewrami language courses too ( Multi-dialects). In addition to adults, the institute also has courses for children including. It carried out language studies through the media within the scope of acquisition planning. The Institute shared its studies on its social media accounts (twitter, Facebook, Instagram, YouTube channel) in order to show these studies to the whole world.

As a conclusion, the institute is conducting its studies on wide ranges. From preparing dictionary to publishing books and magazines, It has played an active role. It also worked on developing the status of the language. On the other hand, thanks to the language course opened, they have both contributed to the Kurdish literacy of thousands and educated Kurdish teachers, working outside of Istanbul, to raise Kurdish rate. They have also reached a large number of Kurdish population with online lessons. Thus it has contributed to the language planning (status, corpus, acquisition). Now it is carrying out its studies under the name of Kurd Language Research Associations.